Çêroka

Robêrt ê şeytan

(Ji efsaneyên Almanî)

Kurdîkirin: ***Cankurd***

2009

Çi hebû, çi tune bû, berî niha bi gelek dem û salan, li welatê Normandî axayekî (Herzogekî) navdar û ji gel ve hezkirî, yê bi navê Hubêrtûs hebû, Xwedê gelek mal û dêrîn dabû wî, û jîna xwe di saya Xwedê de bi qencî û başî derbas dikir, qeraltî û deselatdariya xwe bi dadmendî û dilovanî bi rê ve dibir. Gelek helbestvanan helbest li ser comerdiya wî vedihûnandin û dixwendin, û stranbêjan li ser wî stran distran. Çêrokên fantaz ên lehengiya wî li ser zimanên çêrokbêjan digeriyan…

Rojekê ji rojan, ku cejna "Weinachten" bû, xanedan û suwar û karmendên wî yên hêzdar di koçka wî ya mezin û fireh de, li bajêrê Vêrnon, li ber çemê Seine, li dora wî civiyan û bi wî re ketine şor û peyvînê. Gelekan ji wî xastin ku ew ji xwe re keçekê bistîne û li xwe marbike, da nijdê wî bêpişt û zar nebe…

Li dawî axayê dilnerm û guhdar gote wan:

"Ez bi xwe çi keçan nanasim, ku li gor cîgah û nav û malbata min be, û ji xwe bo min wê ne asan be, ez dakevime jêr û jinekê ji xwe re bistînim û di dema pêş de ez li xwe û li hilbijartina xwe poşman bibim. Bo min rewş wekî niha bimîne baştire, lê gava Xwedê bixwaze wê keçeka şîrhelal bi zûkî bibe hevjîna min."

Pîremêrekî ji xanedanan rabû ser pêyan û destûra peyivînê ji axayê xwe xast. Axa bi desthejandinekê rê dayê ku bipeyive.

Pîremêr got:

"Wilo nabe axayê min, ez keçekê dinasim, hem ji malbateke bala û navdar e, hem jî ji rêz û çîna we ya hêja ye, sipehî û zîrek, çeleng û mêşeng e... Li gor nav û cîgah û başbûna we ye... Ew dota axayê (Herzogê) Burgund e."

Axa got:

"-De bila."

Axayê ku ji wê gotinê hezkirî, gelek peyrew dan pey xwe, karwanek ji diyariyan dagirt û berê xwe da welatê Burgundiyan. Axayê Burgundê ne tenê derket silaviya wî, belku teviya peyrewên wî jî hatin pêş Hubêrtûs axa, bo daxaza wî erê kir û ji dota xwe re dewateke şên û mezin li dar xistin, û Hubêrtûs axa bûka xwe suwar kir û vegeriya hat cîh û warê xwe.

Destpêkê di razang û mal û koçka axayê zava de gelek şadî û hezkirin hebû, hema ji ber ku zarokên wan pêda ne bûn, hêdî-hêdî ew şadî bû xemgînî, û ew hezkirin jî sar û sist bû. Wî û bûka wî pir li ber Xwedê geriyan, daxaza kurekî jê kirin, lê bê encam. Rabûn daketin nav gel û pir diyarî û pere li hejaran û li dêrên *'kenîseyên'* ku piştvaniya hejaran dikirin dan. Bi ser de jî pir guhdariya toxtir û hekîman kirin û gelek

derman birin û pir geyayên nenas jî kelandin û avka wan vexarin, hema bê mifa…Xemgîniyê perdeya xwe bi ser teviya bajêr de berda û nema li bajêr şahî çêdibin.

Carekê bi êvarê re xanim hate ba Hubêrtûs ax, dît ku ew pir hosan bûye û çîkên şer û nevînê ji çavên wî dipekin. Axa got:

"-Bo çi em evqas li ber Xwedê digerin û tew haya wî ji me tune ye? Gava ew me ji bîr dike, emê jî wî ji bîr bikin. Me gelek qurban dan û yek daxwaz ji wî kir, lê dîsa jî guh neda me."

Paş wê yekê bi kurtedemekê zarowek bi dangê 'reh'mê' xanimê ket û li ciyê xemgîniyê di koçk û seraya Herzogê Normandî de dîsa bû şadî, hema tirsa xanimê jî roj bi roj mestir bû. Ber destê sibeyekê, jan û siziyên cane wê bilind û mekin bûn û êşeke berê nedîtî kete hinavên wê, ew wekî asikeke bi daveke hesinî ketiye û birîndar bûye, wilo êşiya, lerizî û kire nalenal. Jinên di mal û koçk û derdora koçkê de hebûn giş ber bi razanga xanimê ve beziyan, du jinên maman û pêşek "*qabîle*" bi lez û bez destêd xwe şuştin, ku harîkariya wê bikin, da zarokê wê ji ber wê bibe. Xanim di wê navê de bû wekî kesekî dupişk ew gestiye û jehir di godveyê wî de belav bûye. Jineka maman gote ya dî:

"-Min çi jineka evqas nazik mîna xanima me berê nedîtiye."

Ya dî lê vegerand, got:

"-Van êş û jan ne wek yên jinên dî ne."

Di wê navê de, li derve bû bad û bahoz, qermîtkên sîvlekên xaniyan firiyan, pîkinên qaling ên darên gir û bilind şikestin, û rohniya ku hêdî hêdî ciyê sorbûnê li asoyê distand, ji nişka ve li ber tariyeke bi hêz berşê bû, gelê bajêr ku ji nav nivîn û doşekan radibû û xwe bo karê rojane amade dikir tirsiya. Axayê ku pişta xwe dabû Xwedê û baweriya bi Xwedê, êdî tirsiya û seriyê xwe daxist û li ber Xwedê geriya, xwe avêt bextê hezretî Îsa û dayîka wî Meryemê…

Hinekan ji mirovan wê gavê bawer kirin, ku Roja Civan û Rabûnê ye, gelek ji wan ber bi dêrê ve beziyan, û gava dergahê wê yê darî yê mezin vekirin, dîtin ku keşe, li ber xaça ku sîngê dîwarê pêşîn di dêrê de xemilandibû, li ser zik xwe avêtiye erdê û ji tirsa dilerize…

Paş gelek bizavên têkçûyî, xanimê zarokê xwe danî, bo mêrê xwe kurek anî, hema çi zarok û çi kur!

Herdu jinên maman û pêşek bi çavin tijî pirs û tirs li hevdu nêriyan, û yekser ser rûyê zarok pêçan, da kesekî dî ji wan jin û keçikên li dora wan in wî nebînin. Rûyê Herzogê Normandî reş û tirş bû, û xanima wî ku tirsiya bû di wê rojê de bemire, nema dizanî çi bibêje. Di roja yekê de ji jîna xwe ew kur wekî zarokekî yeksalî ne yekrojî dixuya!

Paş ku ew mindal birin dêrê, da keşe avreşînê "*tewafê*" jêre çêbike, mindal ewqas qîriya û di navdestên dayîk û bav û keşe de liviya û lebitî, ku nema dikanîn tiştekî bikin. Hemî

mirovên ku bawermend bûn, di wê rojê de wekî neyaran li hev dinêriyan, dikanîn wekî gurên birçî goştê hev bi diranan biçirînin… Dawî keşe avreşîn teva kir û navê Robêrt dane mindal.

Robêrt di yeksaliya xwe de wekî kurekî pêncsalî dixuya, seriyê xwe ji kesekî re nediçimand, li hevlîskên xwe dida, por û pêlikên keçikan dikişandin, bilbil û pisîk dikuştin, dijûnên gemarî bo her kesekî/kesekê digotin û herdem dikete pevçûnan, bi dayîk û bavê xwe re, bi heval û hogiran re û bi mamosteyên xwe re jî…

Ji wê demê ve, êdî xelkê bi dizîka di nav hev de nav li kurê axayê xwe kirin: **Robêrt ê Şeytan**.

Axa û peyrewên wî li hev rûniştin û bi hev şêwirîn, ka çi bikin da ev lawik baştir bibe. Li dawiyê axayê ku ji dil dixast kurê xwe bîne ser rêya rast, ferman da ku Robêrt bidine dest kesekî hêzdar û hişmend, da wî fêrbike zanîn û Îzan û her babeteke şervaniyê.

Mixabin! Di hevdîtina yekemîn a şagird û mamoste de, şagird ji nişka ve xencera mamoste ji ber nava wî revand û di dilê wî de vena. Mamosteyê xûn û xirar bi ser cil û govdeyê wî de diherikîn, ber bi koçka axayî ve beziya, hema segên Robêrt rê li wî girtin, û wilo hêriş ser wî kirin, ku çi delîve li ber mamosteyê birîndar neman û jîna xwe li hewşa axayê xwe ji dest da. Ji wê rojê ve, êdî kesekî nediwêrî li ser fêrkirina

Robêrtê Şeytan bipeyive û kesek ji mamosteyan ne amade bû wî fêrbike. Ew bêfêrkirin mezin bû… Gava diçû dêrê jî, ne bo tiştekî fêrbibe an bo şuştina gunahên xwe li ber Xwedê bigere, belku bo ji xwe re yarî û henekan bi keşe û bawermendan bike. Robêrt tew nedizanî baweriya bi Xwedê çiye.

Dayîka wî, sibê ta bi êvarê, li ber Xwedê digeriya û digiriya, ji Xwedê dixast, ku ew dilovaniyê têxîne dilê kurê wê, wî ji "*Şeytanbûnê*" qurtal bike, da ew jî rojekê wekî bavê xwe bibe qeralekî dadmend û hezkirî di nav gel de. Hema bavê Robêrt her roj nifir li roja zayîna kurê xwe dikir.

Di wê demê de, binavkirina mêrekî wekî "*Suwar*" hem serohateke rûmetdar bû û hem jî xewn û daxaza her xortekî Normandiyan bû. Malbatên xanedan û karmendên dewletê her amade bûn ku pir dayîn bidin, da kurên wan bibin "*Suwar*". Dayîka Robêrtê Şeytan ji mêrê xwe xast, ku kurê wan wekî "Suwar" bite binavkirin û naskirin, bi hîviya ku ew rewşa nû jiyana wî biguhêre û ji berê baştir bibe…

Herzogê Normandî ne tenê erê kir, belku hemî bizavên xwe kirin, da daxaza xanima xwe bi cîh bîne. Bang li giş Baron û xanedanan kir, ku bên koçka wî, şahiyeke mezin li dar xist û di nav wan tevan de bo kurê xwe got:

"*-Min û van hemî hêjayan biryar kir, ku em te bikine "Suwar" û ji niha û pê ve tu wekî suwarekî rabî û rûnî, tu xudan li*

serohatên suwaran derkevî û serkêşiya wan bikî, piştvaniya wan bikî û her amade bî bo ku tu biçî hawara wan gava pêdiviya wan bi harîkariya te hebe."

Kurê wî yekser li wî vegerand:

„- Bo min wekî hev e, ez şêweya jîna xwe naguhêrim. Çi suwar û çi peya, çi serdest û çi bindest, çi padişah û çi kole, li ba min wek hev in."

Herzog pir xeyidî, dilê wî bi lez lêda, peyrew û mêvanên wî di xwe de tengijîn, pir li ber herzog ketin. Hinekan bizava xwe kirin, ku bi kurê wî re bipeyivin, da wî ji serhişkiya bê mifa daxînin û ew seriyê xwe ji bavê xwe yê deselatdar re deyne, biramûse destê wî û poşmaniya xwe bîne zimên, û hineka av reşand ber dilê Herzog û ji wî tika kirin, ku xwe pir hosan neke, da dilê wî astengiyan ji wî re pêda neke…

Ji serohatên Suwariyê bû, ku mêrê bibe suwar, şeva berî binavkirina wî di dêrê de bi nimêjê derbas bike. Robêrt ê Şeytan tew ne bawermend bû, hema ji bo henekên xwe çû dêrê û şeva xwe li wir derbas kir.

Roja dî li trat û meydana mezin a bajêr lîskên suwariyê dest pêkirin, gelek suwarên hêja û xort bi hespên xwe yên kumêt û nijd derketin holê, ku bi Robêrt re di bezînê ‚cirîtê' kevin, an jî bi şûr û mertalan bi wî re bilîzin, hema bi tewat û rûmet, bê ku hevdu biêşînin an birîndar bikin. Lê Robêrtê Şeytan

tew nedizanî wan serohatên bala û hezkirî çine. Li wan dida, an li hespêd wan, gelek ji wan birîn kirin, û yek ji wan bê ku pevçûneke rastîn hebe da ber şûrê xwe û kuşt. Ne tenê bavê wî ji wî hosan ‚aciz“ bû, belku hemî mêvanên temaşevan û giş suwarên hevlîsk ji dora wî bi dûr ketin û nevîna wî kirin. Gava ew bi tenê xwe di trata lîskê de maye, hespê xwe ji wir bezand û bi derveyê bajêr de lezand û bi dûr ket.

Ji wê rojê ve Robêrt bû çeteyekî talanker û xûnrêj. Davêt ser malên maldaran, hin dikuştin û hin birîndar dikirin, malê wan talan dikir û agir berdida avahiyên wan, zorbaziyeke bê wekanî li hejaran jî dikir, û gava bavê wî nûnerên xwe dişandin, ku bi wî re bipeyivin, bi daxaza vegerandina wî, Robêrt ê Şeytan ziman an guh û difnêd wan jêdikirin, û gava çavên yekî ji wan diperçiqandin, digot:

„-Here mala xwe, êdî çavên te nema rohniya royê dibînin, tuyê kanibî demeke dirêjtir rakevî!“

Nav û hovîtiya Robêrtê Şeytan li her derekê di memleketê de belav bûn, û bi taybet neyartiya wî ji keşe û dêran re, ku ewana disotandin û li ber çavêd bawermendan bi pîsîtiyê gemar dikirin. Dayîkan zarokên xwe bi navê Robêrt dikirine xewê, û cotkaran bi egera tirsê ji wî di mal de diman û tew nediwêrîn biçin nav zeviyên xwe an jî yên axayêd xwe… Lê ew navê bi hovbazî belav bûye, hêla ku diz û keleş, kuşter û xûnrêj, dijmin û neyarên axan û herzogan giş li dora wî bicivin û bi armanca talankirinê bûn peyrewên wî, lê tev jî ji

wî ditirsîn, kesekî nediwêrî li çavêd wî binêre an seriyê xwe li wî hilde.

Herzog binzor bû ku leşkerekî mezin bi hev xîne û derkeve li kurê xwe yê serhildêr û mirovneyar bigere, da wî bikuje an bigire û vegerîne keleha xwe.

Di wê navê de Robêrt ê Şeytan keleheke xwe ya asê avakiribû, da kesek nikanibe hêriş ser wî bike. Gava wî bihîstiye ku bavê wî biryara girtin an kuştina wî daye, gote peyrewên xwe yên tirsiyayî:

„-Ezê hem bavê xwe û hem wan xanedanên ku bavêjin ser me gişan bikujim, koçk û kelehên wan talan bikim û li we belav bikim.“

Peyrewêd wî êdî baş nas kirin, ku mayîna wan bi Robêrt ê Şeytan re wê mirinê ji wan re bîne û derketina li hember wî jî wê mirinê bîne. Nema dizanîn çi bikin. Robêrt xast ku ji wan re wêrekiya xwe diyar bike, lew re rabû bi tenê xwe derket talanê.

Di rê de ew pêrgî hinek mirovan hat, ku diçûne Hecê. Şûrê xwe ji ber nava xwe kişand û bi nav wan ket, yek û yek kuştin an birîndar kirin, lê kesekî li hember wî kosanî nekir ji ber ku wan nevîna ceng û pevçûnê dikirin, lew re jî berxikiya wan bo Robêrt dilşadiyeke mezin pêda kir û bedkariya xwe bir serî. Teviya rû û cilêd wî di xûnê de man.

Demekê çû, pêrgî şivanekî hat, şivan ew naskir û pir ji wî tirsiya, lew re bi lez gotê, da Robêrt seriyê wî jî nefirîne:

„-Diya te hatiye koçka xwe li Arques, ku li wir demekê nimêj û dirazên xwe bi armanca vegera te bike.“

Dilê Robêrt ê Şeytan bi ser dayîkê de çû û bi lez lêda. Rabû berê xwe da koçka dayika xwe li Arques û di rê de dîmenê wî di nav wan mirovên ku diçûne Hecê de hate ber çavêd wî, ew ji navê ve lerizî û tevliheviyek di zikê wî de pêda bû û bi jor ve wê tevliheviyê xwe hilda. Li xwe hişyar bû, ew çi hov e û nevîna xwe kir… hêdî-hêdî dest bi nifirînan kir û sîngê wî teng bû.

Ew giha ber dergahê koçkê, hema kesek ji berdest û azepan nehate pêş wî, û ne kesekî hefsarê hespê wî ji destê wî girt. Rabû hefsarê hespê xwe bi çingalekî ve girêda û di pêlîkaneke mermerî re pile bi pile, bê deng bi jor ve hilkişiya, çû odeya dayîka xwe. Gava dayîkê kurê xwe wilo bi cilên ku ji xûnê sor bûne dît, ew jî bi berdest û keçikên derdora xwe re ji ber wî reviya û ji tirsa qîriya.

Robêrt ê Şeytan bi xwe jî matmayî bû, nema dizanî çi bike. Dawî ber bi wê paşmaxê ve çû, ku dayîka wî reviya bû hindirê wê, li ber derî rawestiya û bi zimanekî nerm li ber wê geriya û ji wê lava û tika kir ku tenha du peyvan bi wî re bike… Paş soliqekê, dayîka wî ji paş perdeyan derket û ber bi wî ve hat, hema ne silav û ne maçeka dayîkî. Li ciyê rûkenîn û

hembêzkirinê rûtirşî û dilgiranî. Robêrt ê Şeytan li xwe hişyar bû, ku di navbera wî û dayîka wî de heft çiyayên berfanî pêda bûne.

Bi dengekî nerm û nizim got:

„-Dayê, ji min re bibêj, bo çi ez wilo bûme hovekî çolan, û bo çi rewşa min wilo ye."

Gava dayîkê wilo bihîstiye yekser hêsir bi çavên wê ketin, li ser kaban xwe li ber kurê xwe berda ser mermerê sar ê koçkê û got:

"-Min bikuje, va danga ku tu neh mehan hilgirtî bide ber şûrê xwe û biçirîne. Ez im ya jîna te wêran kirî, heger min tu ne anîba vê jînê, ma tuyê çewa wilo biba? "

Dest û kab li Robêrt ê Şeytan sist bûn. Bi milên dayîka xwe girt û got:

"-Rabe ser xwe dayîkê, bila xûna min di ber te de birije. Ezê çewa dayîka xwe bikujim an êşê bigihînim moyekî ji moyên porê te yê zêrîn? Rabe here ji bavê min re bibêje, ku Robêrt wê biçe ba Papazê mezin li Roma, da xwe bavêje ber lingêd wî û bexşîn û lêborînê jê tika bike. Robêrt wê xwe ji bedkariya hovane paqij bike û bikeve berdestiya qenciyê dij bi neqenciyê."

Dayîka wî, wekî kesekî ku ji darvekirinê an ji serbirrînê azad bûye, yekser nûçe bo mêrê xwe hinart, ku kurê wê ji rêya nebaşiyê vedigere ser rêya rast. Herzog di pêş obeke suwaran de ber bi Arques ve firiya… Herzog gote peyrewên xwe:

„-Xwedê kurê min li min vegerand, hema ez nizanim ezê çewa ji bin barê wan mirovên ku wî kuştine derkevim. Ezê bi nimêj û dirazan, bi dayîna gelek berhem û qurbanan bizava xwe bikim ku Xwedê lêborîn û dilovaniyê li min û li kurê min bike…“

Robêr ê Şeytan ku biryara xwe daye bo çûyîna Roma, da li wir li ber Papazê mezin lêborînê bixwaze, rêya xwe bi peyrewêd xwe xist, ku li nav çiyan li benda wî mabûn. Robêr gote wan:

„-Hûn dizanin ez çi bêşim, çi hov im. Min gelek mirovên ku çi ziyan bi min nekirîne dane ber şûr û tîrkevan û xencera xwe. Min evdalên dêran bi darve kirin, guh û zimanên şivan û gavanan jêkirin. Herdem bê dilovanî û bi dilekî hişk wekî zinarên çiya. Hema ez li xwe hişyar bûm û Xwedê rêya ronahiyê li ber min da xuyakirin. Werin bi min re, em tev ji çol û beyaran vegerin nav gelê xwe, em biçin heca xwe li Roma bikin û lêborîn û bexşînê ji Papazê mezin tika bikin…“

Yekî ku ji van gotinan gelek hosan bûyî, bi dengekî ku ji ber xeyda dilê wî lerzokî bûye, gotina wî birriya:

„-De binêrin, ev nermik û germik çi dibêje! Gunahên wî ji yên me tevan bêtir in, niha jî dixwaze bibe evdal…Ne dûre ew biçe dêrê û tew jê dernekeve.“

Wilo got, keniya û pişta xwe di Robêrt yal kir. Robêrt ê ku xûn di quncikên çavan de civiyaye, destê xwe avêt gurzekî hesinî yê ku bi berdehê hespê wî ve daliqî bû û bi teviya hêza xwe ew gurz li pişta wî da, ew peyrewê gir û qanat bi devgeza çû xarê û yekser hate kuştin. Ewên dî li Robêrt hatine hev, bi şûr û mertalan li wî civiyan, hema Robêrt ê wêrek û zîrek, bi hêzeke bê wekanî li wan da, yek û yek avêtin xarê, hin kuştî û hin birîndar kirin, ku nalenala wan bilind bû. Peyrewên ku hîn nehatîne kuştin an birînkirin ji wir baz dan û reviyan.

Robêrt ê Şeytan, paş wê qirkirinê, çekên xwe avêtin, xûna ku bi ser cilên wî de ji wan diz û keleşan pijiqiye piçekî bi destmalekê paqij kir, ji wir bi dûr ket, çû pişta xwe da koka dareke kevnare, rûnişt û hizrên xwe kirin. Demeke wilo ma, ta tariya şevê perdeya xwe bi ser wî û bi ser wan qeracan de berda. Li Asîmanê bilind, şîn û sayî, stêrk xuya bûn, û ji nişka ve hate bîra Robêrt, çewa ew di zarotiya xwe de, derdiket ser surha kelehê û stêrkên asîmanê dijimartin, hema bo wî asîman û stêrk, sirûşt û jîngeh ji zû ve hatibûn ji bîr kirin, tenha xûnrijandin û jînvemirandin bûbûn pêmijûliya serekîn.

Dereng dereng ew ji cîh rabû û berê xwe da dêrekê, ku xaça wê bilind ji dûr ve dixuya. Gava giha ber dergahê dêrê hate

bîra wî, ku wî carekê ew dêr talan kiribû û hinek evdalên wê dabûn ber lêdanê. Piçekî hizirî, ber bi dergahê ve çû destikê hesinî hilda û lêda. Taqek vebû û du çavên tijî pirs û tirs têre xuya bûn. Paş kurtedemekê dergah vebû û çîreçîrek jê hat. Evdal ên dêrê, çi mêr û çi xang, tev ji ber wî reviyan, ji ber ku hate bîra wan jî ew çi bêş e, û cilên wî yên ji xûnê baş paqij nebûne tirsa wan hîn mestir kirin. Tenê keşeyê pîr bi wêrekî ber bi wî ve hat û bê deng di rêya wî de wekî koka dareke bilind û kevnare, rawestiya.

Robêrt ê Şeytan bi dengekî nizim û bi nermî got:

„-Ez dizanim, hûn ji min ditirsin. Erê ez hovbazekî kuşter im.“

Keşe çi bersiv neda.

Robêrt di ber wî re ber bi perestgeha li bin pûtekî mezin ê xaçkirî ve çû, ku ji mermerê hatibû çêkirin û bi sîngê xaniyê serekîn ê dêrê ve hatibû daliqandin, xwe li ser çogan berda ser erdê, destên xwe dan ser maseyeke ku li pêş wî bû, seriyê xwe xar kir, û bê liv û bê şiv demekê wilo ma. Evdal matmayî bûn.

Keşe hêdî hêdî ber bi wî ve hat, xaniyê serekîn ê vala û fireh dengê teprepa solên wî veda. Gava gihaye nêzîka Robêrt, Robêrt dest avêt keviyên seraserê ‚*ebayê*‘ wî yê dirêj û rengmor û maç kir. Dilê keşe, ku berî wê hatibû badan,

vehesî û xwe bi ser wî de xar kir, kûr li çavêd wî yên tijî hêsir nêriya. Robêrt got:

„-Bavê min ê rohanî, vaye kilîtê deriyê mala ku min û talankerên dî ji zêr û pereyên me ji xelkê bi darê zorê standibûn tijî kiriye. Ji comerdiya xwe bibe ji bavê min re, bila li xudanan vegerîne û ewên ku min xudanên wan kuştîne bila bo karê qenc, bo dêran û bo hejar û sêwiyan belav bike, bike bexşîn û diyarî ji birçiyan re.“

Keşe seriyê wî bi hêz hembêz kir, wekî bavekî ku pir ji zû ve kurê xwe winda kiribû û ji nişka ve bi xwe vegeriya hate mal.

Wê şevê Robêrt bû mêvanê dêrê û gelek baş raza. Roja dî hesp û cilên xwe yên suwariyê dan evdalan, û ji wan kirasekî evdalan xast. Kiras li xwe kir û kete rêya hecê, berê xwe da Roma, û xarina xwe di rê de bi rêya parskirinê ji gundiyan bi destê xwe xist. Birçî di ber rez û mêwebaxan re derbas bû, hema tew li wan ne nêriya.

Robêrt bi dilekî vehesiyayî, bi tewateke berê nedîtî giha Roma. Papazê mezin di wê rojê de derketibû qada Sant Pêter û bi ser gelê ku li wir civiyayî nimêj û dirazên xwe dikirin. Robêrt di nav xelkê re xwe bi zora milên xwe yên hêzdar gihand rêzê pêşîn, û tevî ku gelekan li wî zor kirin da wî bi paş ve bidin, kanî bû xwe bigihîne bin pencereya ku Papaz têre dihate xuyakirin, xwe li ser zik avête erdê û bang li Papazê mezin kir:

„-Ey Papazê min î pîroz, dilovaniya xwe li min bike.“

Ev gotina xwe dubare kir, û xwe li ser çogan berda ser erdê. Papazê ku wekî şivanekî haj pezê xwe heye, li teviya serlêderan temaşa kir, pişt re bersiv da, got:

„-Bipeyive, kurê min, bipeyive û dilê xwe vehesîne, ji qerêja vê jînê pak bike.“

Robêrt got:

„-Papazê pîroz, ez li xwe dimikirim ku min gelek gunah û şaşî kirîne, wekî ku Şeytan di mejî û canê min de pînika xwe ava kiriye, nema jê difire.“

Papaz lê vegerand:

„-Qey tu Robêrt ê Şeytanî, kurê herzogê Normandî yî?“

„-Erê, cîgirê Xwedê li ser rûyê zevînê, ez Robêrt ê Şeytan bûm, hema ez niha hatîme lêborînê ji We dixwazim.“

Papazê mezin ji Robêrt xast ku ew biçe ba keşeyekî li dêreke derveyê Roma, ewê mukiriya Robêrt bibihîse, û wê cezayekî bo rakirina gunahan ji ser wî bide diyarkirin. Robêrt yekser erê kir û bi lez ramûsî destê Papaz, ku li hafa seriyê wî di pencereyê re dirêjkirî bû.

Robêrt çû wî gundî, ku dêr a mukiriyê lê bû, seriyê xwe li ber keşe çemand, ramûsî destê wî jî û jê re got ku Papazê mezin

ew şandiye ba wî, da keşe guhdariya mukiriya wî bike û cezayekî ji wî re bêlî bike. Keşe gotê ku pêwîste teviya şevê li binê xaça bilind di hola dêrê de Robêrt nimêjê bike û roja dî derbas bibe xanîkê piçûk ê bo mukiriyê û hemî gunahên ku kirine bo wî bibêje.

Robêrt wê şevê ne xwar û ne vexwar, nimêja xwe bê rawestan gudand, ta bi bilindbûna royê gazekê di ser wan çiyan re, ku li rojhilatê gund bûn. Di wê şevê de keşeyê dêrê jî pir nimêj kir û ji xwe pirsiya, ka çi pêwîste ew wekî ceza bo Robêrtê Şeytan diyar bike, da ew careke dî sînorên Xwedê derbas neke û di civata xwe de herdem mirovekî baş bimîne.

Gava Robêrt teviya hovîtiyên xwe di tariya odeya mukiriyê de ji keşe re anîn zimên, keşe yê ku di paş perdeyekê guhdariya wî bê liv û bê şiv dikir, got:

„-Kurê min, tuyê biryara xwedayî, ku ji devê min derkeve bi cîh bîne, tevî ku ew pir giran e jî.“

Robêrt got:

„- De bila. Ezê bi cîh bînim.“

“-Tuyê wekî evdalekî, derwêşekî an qelenderekî, bi cilin çirrî û gemarî li nav gund û bajarn bigerî, û tuyê xwarina xwe ji devên segan birevînî, û xelkê çi bo te gotin an çi anîn seriyê te, tuyê bi bi dilfirehî û bê vekariyeke nepejirandinê li hember wan dernekevî, ta tu di xwe baş bawer bikî ku jîna te ji binî ve

hatiye guhartin û te rast dev ji Şetanbûna xwe berdayî, tu bûyî mirovekî dirist, mirovhez, Xwedawend û dilpak."

Robêrt ew biryar pejirand, tevî ku biryareke giran û ne asan bû… Rabû xatirê xwe ji keşe xast, xwe çemand bo ramûsana destê wî yê dirêjkirî û kete rêya Roma, û wekî keşe gotiye wilo kir. Hema hêsir di çavan de civiyan û zanî bû ku wê di civatê de bibe qeşmerekî gêj, şêt û dînekî ku herdem hejar û bûdele… Ma wê çi bike, gava biryar birayareke xwedayî, ji devê keşeyekî ku wekî dergevanê dergahê Xwedê têye dîtin û nasîn?

Robêrt bi kirasekî çirrî û bihingenî giha Roma, û gava birçî dibû, li ber çavên lawik û keçikên matmayî dibûn, xwarina xwe ji ser sergoyan, ji nav ling û devên segan direvand û davêt devê xwe. Lawik û keçik bi pey wî diketin, bi şiv û daran li wî didan an jî kevir davêtin wî û bang lê dikirin:

"-Dîno, dîno!"

Robêrt li wan venedigerand û bi xwe ve gêro dibû, û hinde caran jî ji xwe dipirsiya:

"-Qey ez rast şêt û dîn im?"

Rojekê ji rojan lêhat û ew giha ber dergahê koçka Qeyserê Roma, û li ber dergahê vekirî dergevan tune bûn, wan harîkariya hinek mêvanan dikirin, ku diyariyên xwe bigihînin hola mezin a di orta serayê de. Robêrt bi asanî kete hindirê

koçkê, û hinekan bawer kirin ku ew şehzadeyeke, wilo bi cilên parsek û hejaran hatiye, da dost û hogirên xwe bixapîne û bi hev re dilşad û xweşiyar bibin. Di orta holê de gelek mêvanên bi cilin giranbiha, tev ji etlez û hevrîşm, bi pir netrik û pelên ji zîv û zêr, bi gustîlkên giran li dora Qeyserê xwe, li ber maseyeke mezin û dirêj bo xwarina nîvro rûniştibûn.

Gava çavêd Qeyser li Robêrt ketin, gote mêvanêd xwe:

„-Heger ev ciwanmêr bi cilin dî bihata, wê wekî şehsuwarekî bixuya. Rê bidine wî, bila evê ku xwe mîna evdalekî sergêj kirî, têr bixuwe, paşê emê binêrin, ka rewşa wî çiye?“

Berdestên Qeyser û mêvanan li ser daxaza Qeyser maseyek ji Robêrt re amade kirin û gelek xwarinên bi goşt û bihinxweş li ser wê maseyê danîn. Robêrt destê xwe neavêt xwarinê,

Qeyser gotê:

„-Fermo, peyayê hêja, bixu.“

Robêrt dîsa nexwar. Koma mêvanan matmayî bû. Du kesên qelew, ku li hember hevdu daîştibûn û rûn û birinc li ser zikên wan rijiyabû bûn, di destên wan de pêtikên biraştî yên qazan hebûn û bi hêrs û lez li devên xwe badidan, li hevdu nêriyan û keniyan. Qeyser di xwe de tengijî, û ji xwe pirsiya:

„-Çewa kesek î wilo hejar, ku di jîna xwe de xwarinên wilo xwe]ik û tamzar nedîtine, daxaza min dişikîne û mêvantiya min napejirîne? Diyare ev rast şêt e!“

Qeyser destê xwe avêt pêtikek goştê mirîşkan û avêt ber segê xwe yî gir û bi hêz, devreş û diranqîç. Robêrt ê hîn ji segê gewr birçîtir bû, yekser û bi lez û bez, xwe avêt ser wê pêtikê, hema seg berî wî rahiştê, û Robêrt jî dest avêtê, û bi zorê ew pêtika goştî ji devê segê Qeyser hilkir. Hemî mirovên ku li wir bûn çavbeloq bûn û tevlihevî di hişên wan de pêda bû, deng û hêlehêla wan, tev li kenîn û tirqiniyên wan bûn. Qeyser ê ku her girangiran dipeyivî û dilivî jî şaş bû, nema dizanî çi bibêje an çi bike. Hema dilê wî yekser bizda û rewşa wî ciwanmêrî dil û mejiyê wî girt û berneda, hema ji ber ku mêvanên wî giş erzan û namirov bûn ew binzor bû ku piçekî bikene û xwe wekî wan bide diyarkirin. Destê xwe avêt nanekê û avêt ber segê xwe. Robêrt nan li banî girt, parve kir, para mezin avêt ber segê Qeyser û para mayî jî bi xwe xwar. Mêvan dîsa keniyan û bi dengin bilind, hema dilê Qeyser dîsa hate guvaştin û vê carê gelek bi êş. Qeyser rabû ser xwe û çepikek lêda, mêvan tev rabûn û yek û yek ji ber maseyê bi paş ve çûn û ji koçka Qeyserê rûçermisî bûye bê deng li pey hev derketin, ber bi malên xwe ve çûn.

Qeyser ferman da peyrewên xwe ku ji Robêrt re ciyekî razanê li nêzîka kozka segê wî amade bikin, da li wir rakeve, hema Robêrt nepejirand li ser wa doşeka giran û bilind û pir

hêja rakeve, wî tenha hesîra bin doşekê rakir û bir li ber kozka segê Qeyser danî û li ser wê raket. Qeyser nekanî bû baş têbigihe wê yekê, hema wê şevê pir hizrên xwe kirin û li dawî gote jina xwe ya, ku wekî wî matmayî ma bû:

„-Eve tiştekî seyr e, ciwanmêrekî wek şehzadeyan dixuye di rewşeke wilo nedîtî û nebihîstî de? Divê em binêrin, ka çi dibe…“

Jina wî ya hişmend li wî vegerand:

„-Tiştekî di bin vê rewşê de heye, evê ku ev ciwanmêrê nenas dike peçeyeke, ku di bin de rûyê wî yê rastîn veşartiye… tenha bi tewat emê têbigihin wê rastiyê. Guh mede peyrewên xwe yên nezan û bêvac, bila ev ciwanmêr bi segên me re bijî, ma wê çi ziyan ji kesekî wilo bê?“

Qeyser û jin a wî, di tenişta hev de razan, û ji ber ku pir westiyayî bûn, bi zûkî di xew ve çûn.

Tevî ku Qeyser pir maldar, xanedan û hêzdar bû, hema di kûraniya dilê wî de û di dilê jina wî de jî birîneke kûr hebû, jîna wan tehl û tirş kiribû û pir caran hevdu bi rexneyan diêşandin, û bi zikgirriya bi hev diketin, her kesekî yê dî tawanbar dikir. Dota wan a ku ciwan û çeleng bû, li ber mêrkirinê bû, hema ji ber tirseke mezin a ku di zarotiya xwe de dîtibû, ji nişka ve lal bûbû û nema dikanî careke dî

bipeyive, û roj bi roj ew di tenahiyê de, wekî guleke Cûrî ya li dûrî baxan dijiya… Jina Qeyser digote mêrê xwe:

„-Te rojek ji hemî rojên xwe bo dota xwe vala nekir, heger te ji zarotiyê de, wekî bavekî, li dota xwe binêriya û harîkariya wê bikira, ew tew neditirsî û wilo bêdeng nedibû.“

„-Xwedê dizane, ez çendîn ji dota xwe hezdikim, hema em çi bikin jî, ew nema dipeyive. Eve qedera me ye.“

„-Mirov dikane qedera xwe bi kanîna xwe biguhêre.“

„-Çawa? Te ev hişmendî ji ku bihîstî?“

„-Ji wan Seresaniyên ku leşkerên wan niha ber bi Romayê ve roj bi roj tên, û nûçeyên wan gihane ta bi koçka me.“

„-Qey tu jî bûyî busirman?”

“-De bese, bese, bo çi em dota xwe nadin serkarê te yê her roj nûnerekî bo min dişîne û destê dota me dixwaze?”

“-Ezê dota xwe tenha bidim şehzadeyekî, ez nadim serkarê xwe yê ku destên wî herdem bi xûna gel in û gendeliyeke bê wekanî di memlekta min de dike.”

“-Ezê ji te re şehzadeyekî ji ku bînim? Ma te kesek ji padişah û şehzadeyên derdora Împeratoriyê ji xwe re wekî dost hêlayî?

Ji ber dilreqiya Qeyser û vegerandina serkarê ku hîvî dikir bi markirina dota wî re rojekê ciyê Qeyser di Roma de bistîne,

di navbera Qeyser û serkarê wî de dilsariyeke demdirêj pêda bû. Serkar ê ku pir hosan bûye di nav xanedan û herzogên ji ber hinde egeran pêwîstiya wan bi zêr û zîv hebû ciyê xwe fireh û bi hêz kir, tiştê wan jê dixast dida wan û bi ser de jî gelek soz didan wan ku ewê rojekê wan çavtêrê her tiştekî bike, gava tiştek bi seriyê Qeyser bê û ew ciyê Qeyser bistîne, bibe Imperatorê mezin. Bi wê tenê nekir, çavik û ajanên xwe bi dizîka hinartin bo serhêzê leşkerê Seresanî 'Busirman' ku ew bi xwe jî li palpişt û xwefiroşan di nav gelê Romî de digeriya, û bi hev re ketine pêwendî û têkiliyan, wekî dibêjin: Av li destên hev kirin…an jî Qazik geriya û serdevka xwe dît…Li dawiyê serkarê Qeyser tev li Seresaniyan bû û bi wan re hevbendiyeke leşkerî li dar xist.

Ev nûçe wekî agirê ku bi belan û genimên zerbûyî keve li teviya Roma belav bû û tirseke mezin xiste dilên giş nişteyanan, ji ber ku wan dizanî ku di her cengekê de, gava serkeftî zora bajêrekî dibin, bajêr disotînin, keleha wê wêran dikin, talan û qirkirinê dikin, jin û zarokan bi zorê dixînin bin xwe û bi wan re li gan dikevin, û paş ku mêran li xazûqan dixînin an seriyên wan dibirrin an jî lingêd wan bi hespan ve girêdidin û ji hev diçirrînin, wan jin û zarokan wekî pezekî didin ber xwe û dibin.

Qeyserê ku ji xiniziya serkarê xwe pir xeyidî bû, bê ku wê xeydê an bê tewatiyê li xwe diyar bike, bangewazî li hemî serhêz û malbatên hêzdar ên li derdora Rom bûn kir û bi xwe

jî kete seriyê hêzên xwe yên suwar, pişthesp bû û ji Roma derket û berê xwe da rojhilatê Roma, ku leşkerê Seresanî ji wê ve dihat. Pevçûneke xûnî ya dirêj wê rojê di navbera herdu aliyan de çêbû, û hêzên Busirmanan di pir ciyan de tejê leşkerê Qeyser çirrand û gav bi gav pêşmêr û şehsuwarên wan di nav rêzên leşkerê Roma re pêşve hatin. Tirs kete dilên Romanan û hêdî hêdî ji wan maldar û xanedanan hinek reviyan û hinekan jî xwe dan destê Busirmanan… Qeyser di xwe de tengijî û tevî birînên ku li rû û milên wî çêbû bûn bi wêrekî û bi tewat di şergehê de ma, baz neda.

Robêrt ê ku bawer kiribû, êdî ew nema vedigere şûr û mertalan, nema xûna kesekî dirijîne an jî bi kesekî re dikeve pevçûnan, ji xwe re li nav baxê şahanî digeriya û çavên xwe bi dîna kulîlk û firindan têrdikirin. Dota Qeyser jî bi dizîka ji pencerekê ve li wî temaşa dikir û dilê xwe bi dîtina bejmêra wî şa dikir… Dota Qeyser ji dîtina pêşîn de ji Robêrt hez kir, hema wê çawa bike? Zimanê wê nagere û nikane bo wî an bo kesekî dî peyvekê jî bibêje. Tew nikane navê xwe jî bo Robêrt bibêje…

Ji nişka ve dengekî berê nebihîstî hate guhên Robêrt:

"-Robêrt, evdalê Xwedêyo, rahêje şûrê xwe û li hespê xwe suwar be, bibezîne û bilezîne, xwe bigihîne Qeyserê xwe û piştvaniya wî bike, ta ew biserkeve û serfiraz vegere… Eve biryareke asîmanî ye."

Robêrt matmayî ma, ji ber ku eve tiştekî yekcarî bû di jîna wî de, û nedizanî çi bike. Li çarexên xwe nêriya, dît ku hespekî sipî yê kumêt û bo suwariyê amadekirî, mexeskirî û gulweşînkirî, li nêzîka wî diçêre, û di berdehê wî de şûrekî wekî yê Êkskalîbor mezin û bi hêz veniştiye. Robêrt carekê li dora xwe nêriya, wekî çavên wî bawer ne kirine û li hîviya kesekî ma, ku jêre bibe dîdarê wê bûyerê, wê temaşeyê, hema kesek nedît û dota Qeyser jî xwe bi zûkî ji ber çavêd wî vedizî û xwe veşart. Robêrt ber bi hêsp ve lezkir, pişthesp bû, şûr kişand û bi tiliyên lingên xwe li nava hêsp da, hesp ji cî hilgavt û ber bi dergahê bajêr ve beziya, wekî babelîskekê Robêrt di dergahê kelehê re pijiqî û bi ser şergehê de çû, ku maweyekê ji bajêrê Roma ve dûr bû.

Di rê de, kî pêrgî Robêrt hat û dît ku ew bi teskeke mêranî û lehengî diçe cengê, yekser bi pey wî ket. Ewana jî gelek bûn, yên ku direviyan û şûrêd xwe ji destên xwe avêtibûn û lez dikirin ku xwe bigihînin malên xwe li Roma. Dîsa li şûrêd xwe geriyan, rakirin û bi pey Robêrt ketin.

Gava Robêrt gihaye şergehê, dît ku Qeyser ketiye tengiyeke wêran, bi lez û bez, bi lêdanin wekî birûskê li qirkên Seresaniyan de, xwe gihande nêzîka Qeyser û seriyên hêrişkarên Busirman firandin. Bi dîtina wê lehengiya mezin dilê her cengewarekî Roma ji berê xorttir bû, û hêrişkarên Seresanî jartir bûn. Paş xûnrijandin û serbirrîneke demdirêj pî û ling li Musilmanan sist bûn û ji trata pevçûna xûnî baz

dan. Qeyser jî bi serfirazî ber bi Roma ve vegeriya, lê her û her diviya binase, ew suwarê bê wekanî kî bû, ewê ku rûyê cengê guhart û bo wî serkeftin anî.

Di baxê şahanî de, hem hesp û hem çekên ku ji nedîtî ve bo Robêrt pêda bûbûn, ji nişka ve winda bûn, û Robêrt vegeriya rewşa xwe ya hejarî, pejmûrdeyî û belengazî, bê ku kesek li wî hişyar bibe, lê tenha dota Qeyser ew dît, hem li çûyînê û hem li vegerê. Ew jî keçeka lal bû…

Bi êvarê re Qeyserê ku hemî şervanên xwe vexwendibûn danê Şîva, li ber maseyeke gelek mezin rûniştbû, ku ser wê bi rengareng mêwe û fêkî, li gel goşt û birinc û xarinên cihê cihê û pir şêweyên mey û avjongê xemilandî bû, û li rûyêd wan mêran dinêriya, yek û yek, da bizane kî ji wan birîn bûye û kî bê birîne. Robêrt jî hatibû li aliyekî daniştibû û xwe zêwirandibû, û ji xwe re guhdariya ken û laqerdiyên wan suwaran dikir.

Qeyser dîna xwe dayê, dît ku birîneke piçûk li ser rûyê Robêrt jî heye, lew re ew hosan bû û guman kir ku dema ew çûbû cengê hinde karmendên koçkê zor li Robêrt ê hejar kirine û rûyê wî wilo birîn kirine. Ew xeyidî û tore bû, hema nedizanî kê wilo kiriye.

Gava li ser pevçûnê bi Seresaniyan re hatiye axiftin, her suwarekî gota wî suwarî kir, yê ku hêrişvan ji ser Qeyser qorî kirine û seriyên gelekan birrîne û bûye egera guhartina

pêveçûya cengê. Gelekan tiştin seyr li ser wî anîn zimên, hema kesekî nedizanî ew kijan suwar bû.

Dota Qeyser ji dûr ve guhdariya wan suwaran dikir. Ew ber bi bavê xwe ve hat û li ber çavêd wî tiliya xwe ber bi Robêrt ve dirêj kir. Qeyser tênegiha mebesta wê çiye, li dawî bi harîkariya jineka ku têdigiha mebest û wateyên destnîşanên mirovên lal, wî naskir ku suwarê li ser wî tê peyivîn Robêrt e ne kesekî dî ye. Hem Qeyser û hem mêvanên wî matmayî bûn û gelekan ji wan tew bawer nekirin û dest bi henek û yariyan kirin, ji xwe re bi Robêrt keniyan. Dota Qeyser pir dilêşayî û bi çavin tijî hêsir ji wir bi dûr ket, ku dilê bavê wê hate bizdan. Robêrt jî xwe bi ser hestiyên di nav lingên segan de xar kir û bi zorê hinek ji wan hestiyan ji wan standin, da piçek goşt ji wan bike û agirê birçîbûna xwe vemirîne.

Demek derbas bû, serkarê qeyser, ê ku tev li Seresaniyan bûbû, agirê kîn û nevînê li ba hevalbendên xwe gurr kir, ewana hurhitandin ku tola xwe ji Qeyserê Roma vedin. Seresaniyan hêriş kirin ser gund û zeviyan , ser bax û malên peyrewên Qeyser, ên ku li derdora Roma bûn. Qeyser ji suwarên xwe xast ku dîsa derkevine derveyî bajêr û li Seresaniyan bigerin û wan di şerekî xûnî de mehf bikin. Robêrt dîsa bi cil û bergên xwe yên suwariyê, bi zirx û çekên xwe yên taybet bo cengê bûn, û bi şûrê xwe yê tûj û birrek, ji nişka ve bi nav suwarên Seresanî ket û dest bi serbirrîna wan kir, leşên wan yek û yek ji hespan ketin xarê. Qeyser û

suwarên xwe pir matmayî bûn, yekser ji wan xast ku wî suwarî ji ber çavan winda nekin, da bizanin ew kî ye, ew çi bêtar e. Seresanî reviyan, suwarên Qeyser bi pey wan ketin, û herdem xwe ji Robêrt ve nêz kirin, da rûyê wî ji nêz ve bibînin û nasbikin ew kî ye, hema Robêrt dizanî çewa xwe ji wan bi asanî vedize û vegere koçka Qeyser, bê ku kesek wî binase.

Dota Qeyser ew dîsa dît, hema tiştek bo bavê xwe an bo dayîka xwe negot, da dîsa nebe qeşmerê derewîn di nav peyrewên bavê xwe de.

Careke dî jî Qeyserê ku êdî dizanî ewê di her cengekê de, bi harîkariya suwarê nenas, biserkeve, ferman da suwarêd xwe ku suwarê wêrek ê nenas ji ber çavan winda nekin û paş ku pevçûn bi Seresaniyan re çû serî, divê suwarên hîn xaş in, suwarê nenas bişopînin, rê li wî bigirin, wî dame bikin û pêçeka ser rûyê wî rakin, da wî sedased binasin. Hema Robêrt guman kiribû ku ewana wê bizavekê bikin, da wî bigirin û wî binasin.

Şehsuwarê leşkerê Qeyser gava Robêrt li rêya vegerê hatiye damekirin jê re bi rêzgirtineke mezin seriyê xwe çemand û ji wî tika û lava kir, ku ew çarîka ser dev û difna xwe bavêje, rûyê xwe bo wan diyar bike, da ewana wî binasin û nûçeyeke rast û dirist bo Qeyserê xwe bibin. Robêrt wekî lêdana birûskekê bazingê damekirinê birriya û hespê wî bi lez hilgavt, xwe ji nav wan azad kir. Lê ji nişka ve tîjka rumekê ji

rumên wan suwaran rastî pêtika lingekî wî hat û ew birîn kir, xûn ji lingê wî pijiqî û suwaran gişan dît çi bi seriyê wî hat. Şehsuwar gote hevalêd xwe:

"-Min ta niha bawer kiribû, ku ev tew ne mirov e, lê vaye min xûna wî bi çavên xwe dît. Erê ev jî mirovekî bi goşt û bi xûn e, hema mêrxasekî qehreman û pir wêrek e, ne dû re jî ew şehzadeyekî ji malbateke şahanî ye, dibe ku ew Burgundî be an Normandî, lê em nizanin ew kî ye, rastiya wî çiye."

Şehsuwar tiştê ku bi çavên xwe dîtiye li ber Qeyser anî zimên û jêre pêşniyaz kir ku Qeyser fermanekê li teviya welêt belav bike û têde bide nasîn ku ew amadeye diyariyeke pir giranbiha bide wî suwarî, heger ew xwe ji Qeyserê xwe re bida xuyanîkirin. Qeyser got:

"-Eve gotineke hêja ye, ma ji dota min bihatir çi li ber dilê min heye, ezê wî suwarî bikim zavayê malbata xwe ya şahanî... Başe, ka qelemdaran ji min re bînin, da ez fermanekê li ser vê yekê bidim."

Li Roma û li teviya memleketa Qeyser nûçe belav bû, ku Qeyser amadeye dota xwe bide wî suwarî ku di cengê de sê caran bûye egera serkeftina leşkerê Qeyser, û bi ser de jî Qeyser bo wî hemî şaşiyan dibexşîne, heta eger wî bizava kuştina Qeyser jî kiribe...

Dost û peyrewan ev nûçe hêja dîtin û hez kirin ku wî suwarî binasin, neyaran jî xastin mifayekê ji fermanê bistînin û bi şêweyekî xwe bigihînin Qeyser û bi wî re baweriyê pêda bikin ku suwar yekî ji wan e. Serkarê wî yê ku xinizî kiribû û bûbû alîgê Seresaniyan gava ev nûçe bihîstiye di dilê xwe de hizirî û anî bîra xwe ku ew bi darê zorê nikane dota Qeyser li xwe marbike, divê ew bi dav û xapandinê Qeyser ji serhişkiyê daxîne… Rabû birîneke wekî ya li pêtika Robêrt çêbûye û nûçeya wê li gelek cî û waran belav bûye, li pêtika xwe çêkir, û tevî ku êşa wê mezin bû jî, lê tenha bi wê terzî dikane xwe bigihîne ba Qeyser û bi wî bide bawerkirin ku ewe suwarê nenas û wî tew xinizî bi Roma nekiriye. Bo serkarê xapînok tenha ev delîve li ber ma bû, û wî bi çavên xwe jî dît û naskir ku Seresanî nema dikanin zora Roma bibin. Lew re bi heyteholeke leşkerî ya mezin kete pêşiya suwarên xwe û berê xwe da Roma. Gava nûçe gihane Qeyser, ku suwarê nenas di pêş komeke mezin a suwaran de têye serlêdana wî, ew pir dilşa bû û nema dizanî çi bike, rabû bi lez û bez derket silaviya wî li hîşta kelehê, û herdu piyên xwe bo wî ji hev kirin, da wî ji dil de û bi tesk hembêz bike, lê belê ev çi kese, ku wilo têye serlêdana Qeyserê Roma? Ne ew serkarê xiniz bi xwe ye? Dilê Qeyser yekser hate guvaştin û nema dizanî çewa bi zûkî bizîvire koçka xwe û dergahê li ser xwe bigire.

Roja dî, hemî peyrewên xanedan, serhêz û şehsuwar, li dora Qeyser di koçkê de, li ser doşekin qaling û di nav gul û kûzikên meyvexarinê de, rûniştin. Serkar û çend suwaran jî di

nav wan de, li hember Qeyser cîh girtin. Ji wan jî ew suwarê ku bi ruma Robêrt birîndar kiribû.

Qeyser deng li serkarê xiniz kir, got:

„- Paş ku te xinizî kir, bi Qeyserê xwe, bi gelê xwe, û bi Romaya ku wekî durreyekê ye di eniya cîhanê de, tu mîna segê li xudanê xwe vedigere hatiyî...“

„-Raste Qeyserê min ê balatirîn padişah e di gerdonê de, ku ez çûm tev li Seresaniyan bûm, ji ber ku ez pir xeyidî bûm, gava te destê dota xwe nedayî min, hema bi zûkî ez li xwe hişyar bûm û ez tew neketim cengê dij leşkerê Roma. Min rûyê xwe pêçand û wekî suwarekî nenas ez di her sê cengan de ji te ve nêz bûm, min suwar û lêdarên Busirman ji ser we qorî dikirin, yek û yek didan ber şûr û rumê xwe.“

Qeyser piçekî berken bû û pirs kir:

„-Qey tuyî ew lehengê nenas?“

„-Herê.“

Hemî mêvanan li çavêd hev nêriyan û giş bi hev re bi dengin bilind keniyan û laqirdiyên xwe kirin.

Serkar ê ku çîkêd agirî ji çavan firiyan ji cîh hilgavt û bi dengekî qebe qîriya:

„-Rawestin, ey zarokên qelew û bêhiş, ma ez qeşmerê we me?“

Qeyser jî got:

„-De hiş bin, wê niha seriyên we gişan bibirre, eve Reşka Şevê, ku me pir dav û kemend danîn da em wî binasin û em bi serneketin… Heylo! Kê dizanî ku suwarê nenas serkarê min î xiniz e?"

"-Ezê bi nîşanekê ji Qeyserê xwe re bi cîh bikim, ku ez im ew suwar û ne kesekî dî."

Qeyser bi destekî xwe li ba kir û got:

"- Başe… başe… Fermo!"

Serkar ser pêtika xwe veda, ku birîna lêdana rumekî baş li ser diyar bû, û di nav mêvanan re geriya, da giş bibînin. Suwarê ku Robêrt bi xwe birîn kiribû matmayî bû, ji cîh hilgavt û devê xwe ji hev kir, da bibêje:"*-Ev ne suwarê nenas e…*" Hema ji ber hovîtiya serkarê xûnrêj tirsiya û devê xwe dîsa girt û di cîhê xwe de wekî miriyekî rûnişt.

Robêrt bi xwe, hîn ji ber birîna xwe dinalî, ji ber ku ew neçû bû ba toxtirekî an dermanfiroşekî, û tenha segan ji wî re birîna wî dialistin. Li aliyekî koçkê, di nav segên Qeyser de guhdariya serkarê derewîn dikir û tew ji wî re ne giring bû çi li wir tê gotin, ji ber ku tenha ew rastiya bûyeran dizane, lê wî jî tew nedizanî ku kesekî dî heye, li wî haydar bûbû, û gava bite xastin bo dîdariyê, ew pir ji Qeyser ve nêz e, ew dota Qeyser bi xwe ye.

Di wê navê de, keşeyê ku Papazê Roma Robêrt şandibû ba wî, da ew rewşa xwe jêre bibêje û daxaza lêborînê jê bike, xewnek dît. Dît ku melekek ji asîmanê dahat û hat li ber seriyê wî nist. Melek gotê ku Xwedê gunahên Robêrt bexşandin û daxaza lêborîna wî pejirand. Melekê nûranî ji keşe re hewalda; Robêrt çi qencekarî di wan salên dawî de kirine.

Gava keşe ji xew rabû, amadekariya xwe kir û kete rêya Roma, kerê xwe yê gir û gewr bezand û lezkir ku here li wir Robêrt bibîne û mizgîna azadbûna wî ji tawanbariyê bigihînê.

Qeyserê Roma tevî ku pir nevîna serkarê xwe dikir, û dizanî ku ew derewan dike, hema çi bike? Fermana wî aşkere bû, ku ewê dota xwe bide suwarê nenas gava ew destê wê bixwaze û xwe ji Qeyser re bide xuyakirin, da binase ew kîye.

Gava dota Qeyser nûçeya dawî ji koçka bavê xwe bihîst, ew ji hêz ket, giriya û bi tevya şevê gilî û gazincên xwe li ber Xwedayê xwe kirin, di dilê xwe de ji Robêrt hez dikir û baş dizanî ku ewe suwarê nenas, û ev serkarê ku bavê wê biryar daye ku wî bike zavayê xwe mirovekî derewîn e, xiniz û gelfiroş e, neyarê nişte xwe ye û hemî ji tirsa li pey wî diçin, kesek ji wî heznake.

Dota Qeyser bi cilê bûkan û bi tac û zêran xemilandin û bavê wê bi destê wê girt û bir dêrê, da li wir bide zavayê xwe yê

ku gişan nevîna wî dikir, hem Qeyser, hem dota wî û hem jî jina wî û belku teviya peyrewên Qeyser jî…

Serkarê Qeyser jî bi xemleke zavayî kete pêşiya peyrewên xwe û berê xwe da dêrê, da bûka xwe ya ku ji zû ve li benda standina wê bû, û ji ber ku ew nedane wî, reviya çû ba Seresaniyan, piştvaniya wan bi hêrişên ser nişt û ser Qeyserê xwe kir… Hinekan ji peyrewên Qeyser gotin bo wî ku dota wî bê mirûze, dilşikestiye û tew naxwaze bibe bûka serkarê xiniz, Qeyser bersiv da wan, got:

"-Ez dizanim, hema ez çi bikim? Ez nikanim ji fermana xwe dakevim…"

Zava û bûk di dêrê de li ber keşe di tenişta hevdu de rawestiyan, bê ku bûk carekê jî li zava binêre. Dota Qeyser, ku ta hîngê nedikanî tew bipeyive, di dilê xwe de dirazên xwe, gilî û gazincên xwe li ber Xwedayê xwe dikirin û ji wî dixast ku ew nehêle wa markirin bi serkeve… û Xwedê banga wê ya di kûraniya bêdengiyê de bihîst û harîkariya wê kir.

Ji nişka ve ew peyivî, gava keşe ji wê pirsiye, ka ew zavayê xwe dipejirîne an ne, wê yekser bi dengekî ku hem keşe û zava, hem bav û dayîka wê jî bihîstiye, bi ser ve jî gelek mêr û jinên ku li paş wê bûn, got:"*-Na.*"

Di dêrê de bû hêlehêl û hemî kesên li wir matmayî bi hev re ketin peyivîn û axiftinê.

Dota Qeyser li bavê xwe nêriya û deng lê kir, got:

„-Bavo, min bi te û tu bi Xwedê, min nede vî serkarî, vî xinizî. Ev ne suwarê nenase. Suwarê nenas ew ciwanmêre ku di nav segên te de dijîye, ne evê ku bûye hevyarê neyar û xûna peyrewên te bi şûr û mertalê xwe rijandiye.“

Qeyser nema dizanî ew xewnekê dibîne û di xewnê de wan gotinan dibihîse, an jî rast dota wî ya zimanlal bi wî re dipeyive û wan gotin ji devê wê dertên… Ji aliyekî dî ve dilê wî ewqas şa bû, hêsir di çavêd wî de civiyan û perdeyeke ji mij û dûmanê dîna wî tune kir…

Di wê navê de, serkarê xiniz ew delîveya kurt ji xwe re bi kar anî, bi lez û bez ji dêrê derket, peyrewên wî jî hinek man û hinek bi pey wî ketin, xwe avêt ser pişta hespê xwe û ji wir baz da.

Hîn di wê rojê de, dota Qeyser, şehzadeya dilşad ku êdî wekî mirovên dî dipeyivî, çû axura ku Robêrt têde çek û debanên xwe veşartine, ji berdestan xast ku wan derxînin û bînin ji bavê wê re. Bavê wê gava ew şûr dîtiye, hat bîra wî ku kesekî wekî Robêrt gir û çalak bi wî şûrî seriyên Seresaniyan li derdora wî difirandin. Yekser ferman da ku Robêrt ji wî re bigirin û bînin. Gava Robêrt ji wî re anîne, ew da ber xwe û bir ba Papazê hemî Katolîkan û peyrewêd wî çek û debanên Robêrt hilgirtin û ketin pey Qeyser û Robêrt.

Di wê navê de, keşeyê ku Robêrt bi „*fermaneke Xwedayî* !“ kiribû heval û hogirê segan, giha bû Roma û hatibû serlêdana Papazê mezin, berî biçe ba Qeyser û ji Robêrt re mizgîna qurtalbûnê ji tawanbariyê bîne.

Paş ku Papazê mezin û keşe birîna li pêtika Robêrt dîtin, wan jî bawer kir ku suwarê nenas ê tîjka hêrişên Sersaniyan şikand ew hejarê nav segane, û Papaz ji toxtirên xwe yên ku baştirîn bijîşkên memleketê bûn, xast ku birîna Robêrt derman bikin, û mizgîna qurtalbûna wî ji tawanbariyê dayê, ewa ku keşe ji wî re berî hatina Qeyser û Robêrt gotibû.

Paş çend rojan, Robêrt ji Qeyser destûra vegerê bo nişte xwe yê Normandî xast, Qeyser erê kir û bo wî hinek cilên paqij ên şehzadeyan li gel hesp û berdest û çek û debanan amade kirin, û bi heyteholeke fermî derketin xatirxastina wî. Qeyser dixast dota xwe ya ku ji Robêrt hezdikir bide wî, hema wî nikanî bû dota xwe bi Robêrt re bişîne welatê Normandiyan. Hem dilê wî û hem jî yê dota wî xemgîn bûn.

Paş ku Robêrt du rojan di rê de çû, Qeyser li xwe poşmam bû, û agir di can û xûna wî re geriya, tewata wî nema. Rabû ji dota xast ku xwe bo rêketinê amade bike, û ji peyrewên xwe xast ku her tiştekî bo geşt û rûştina wî amade bikin.

Di wê navê de, Robêrt xewnek dît ku melekek ji wî dixwaze, ew vegere Roma û dota Qeyser li xwe marbike. Du carên dî jî ew xewn dît. Rabû ji berdestên xwe xast ku bi wî re bizîvirine

Roma. Di rêya vegerê de ew û Qeyser pêrgî hev hatin. Qeyser û dota wî ji hespên xwe peya bûn û Robêrt jî xwe ji hespê xwe avêt xarê û ber bi hev çûn. Robêrt bo rêzgirtinê xwe li ber Qeyser li ser çogan berda ser zevînê û seriyê xwe çemand, hema Qeyser bi lez xwe bi ser wî de xar kir, bi herdu destan rêhişt milên wî, ew ji cîh rakir û bi hêz hembêz kir û rmaûsî rûyê wî yê paqij.

Qeyser got:

„-Melekên Xwedê ji me dixwazin, em bibin malbatek, tu çi dibêjî, şehzadeyê Normandî?"

"-Bo min rûmetdariye ku ez bibim zavayê Qeyserekî mezin ê mîna We."

Qeyser li Roma şahîyeke mezin, dewateke bê wekanî ji Robêrt ê Normandî û dota xwe re li dar xist, gelek xanedan, keşe û serhêzên leşkerî ji Roma û ji navçeyên derdora wê vexwendiyê wê dewatê kirin, ciyê rûniştina Robêrt û bûkê di navbera yê xwe û yê Papazê mezin de amade kir.

Di wê rojê de gelek diyariyên giranbiha ji her şêweyekê bo bûk û zavayê Qeyserî hatin. Dewateke şên û navdar bû, ku dilê her ciwanekî/kê pê dima… û demeke dirêj di pey wê rojê re li ser zimanan ma.

Kurtedemek di ser wan bûyerên xweşik re derbas bû, Robêrt bûka xwe suwar kir, kete pêşiya rêzekî dirêj ji peyrew û

berdetan, bi gelek diyarî yên giranbiha vegeriya hate nişte xwe yê pir ji zû ve nedîtibû. Li wir têgiha ku bavê wî, herzogê Normandî koç kiriye diyarê dilovaniyê û dayîka wî pir jar û pîr û xemgîn bûye. Lê gava wê kurê xwe û bûka wî dîtin pir dilşa bû û gelek caran got û dubare kir:

"-Heywax, Robêrt ê mino, bavê te çendîn dem bi hîviya vê rojê derbas kirin !"

Bi hatina Robêrt re tirs kete dilên wan hemiyan, ewên ku bizavên xwe dikirin bo deselata herzogiyê li şûna bavê wî ji xwe re bistînin, ji wan jî serekê diz û keleşan, ku berê peyrewekî Robêrt bû di dema talanî û reşkariyên wî yên şeytanî de, dema ew bi Robêrt ê Şeytan dihate binavkirin.

Robêrt ê ku lehengî û xedariya wî li Roma bi zûkî belav bûbû, bi zûkî kanî bû gelek suwar û peyrew li dora xwe bicivîne, wekî lêdana birûskê bavêje ser keleha diz û keleşan, wê bistîne û wan diz û keleşan bigire û bîne bide destê dadkarê Normandî, da wan li gor kirin û nebaşiyên wan tawanbar bike, û di demeke kurt de welatê Normandî ji berê baştir, hêzdartir û diristir kir.

Xwedê kurek da wî, navê Rîçard li wî kir. Jina wî jî, wekî wî bi wê zayînê pir dilşad û bi hîvîtir bû ku wê kurê xwe wekî mêrê wê be, comerd, wêrek, çalak, zîrek û Xwedatirs …

Rojekê ji rojan nûçe gihane wî ku serkarê xiniz li hember xezûrê wî, Qeyserê Roma, dîsa derketiye, wî avêtiye ser Roma, bi destê xwe ve aniye û Qeyser kuştiye. Robêr bi lez û bez leşkerekî normandî anî ser hev, li hespê xwe suwar bû û di pêşiya suwarên xwe de berê xwe da Roma.

Di pevçûneke xûnî ya dirêj de, Robêrt serkarê xiniz berbiçav kir, hespê xwe ajot ser hespê wî û bi wî re kete şûrbaziyê. Paş çend lêdanên bi hêz, ew ji hespî ve avête xarê û bi lez peya bû û tîjka şûrê xwe di qirka wî de guvaşt, xûna serkarê xiniz pijiqî û axîneke bê wekanî jê hat. Gava peyrewên serkarê xiniz wilo dîtin û axîna serekê xwe bihîstin, yek û yek ji şergehê reviyan, hinek bi suwarî û hinek bi peyatî, ji wan jî hebûn, ku debanên wan ji destên wan ketin, cilên cengewaran ji ser xwe avêtin, da wekî cotkarin hejar bên xuyakirin, ku tew ewana serkarê xiniz nanasin…

Peyrewên giş zorbazan wilo ne, di tengiyê de revrevokin, tirsokin û li rêber û serokên xwe xudî dernakevin…

Gelê Roma ji Robêrt xast ku ew bibe Qeyserê Roma û teviya Împeratoriyê, hema wî nepejirand û dîsa vegeriya welatê xwe Normandî.

Paş çend salan dayîka wî koç kir û dilê wî ji wê yekê êşiya, ku demeke dirêj dayîka wî ji ber şeytanbûna wî û ji ber dûrketina wî kete nav jan û êşê…

Paş wê yekê bi deh salan jî jina wî, dota Qeyserê Roma koç kir û dilê Robêrt hîn ji berê bêtir êşiya. Gelek şevan di tenahiyê de giriya ji ber ku wî pir ji jina xwe hezdikir. Rabû li dawiyê deselatî û dêrîna xwe giş da kurê xwe yê ku bûbû ciwanekî hêja û hêzdar, Xwdatirs û dadmend… û berê xwe da dêrekê, û salên xwe yên mayîne di wê dêrê de derbas kirin, ji hilatina royê ve ta bi daketina wê nimêj dikir. Û bi şev jî li ber mûman dest pêkir fêrbûna xwendinê, ta xewê çavêd wî yên kêmrohnî binzor dikirin ku bêne damirandin…

Rojeke biharê, ku bihna kulîlk û geyayên cûrecûre ji hewşa dêrê di pencereyekê re dihat, û bayekî hênik rîha Robêrt dihejand, rûyê dota Qeyser hate ber çavêd wî yên nîvvekirî, wê destê xwe bo wî hejand û gotê:

"-Robêrt, were… were bi pey min de… li derve bihare…"

Robêrt jî destê xwe yê rastê dirêj kir ku bi destê wê bigire, hema ew ji wî bi dûr ket, kirasê wê yê sipî û tenik biber bayê nerm ket û Robêrt bizava xwe kir ku rabe û li pey wê bibeze, hema zor û kanîna wî nema bû, destê wî ket tenişta laşeyekî sar ê ku tenha ji çerm û hestiyan bû…

Di wê rojê de li dora wê dêrê bi hezaran şervan û şehsuwar û cengewar hatin serlêdana herzogê xwe yê mezin… û giş bê deng li dora termê wî civiyan. Ew di hewşa dêrê de, di tenişta jina wî de, ku li ser daxaza wê, di wir de hatibû çalkirin,

veşartin û bi hembêzan kulîlk jêkirin û li ser gora wî belav kirin…

Navê Robêrt di nav Normandiyan de ji wê rojê de pir belav bû, û kurê wî jî, bi baweriyeke mezin, bi Xwedatirsîn, bi comerdî, bi mêranî û bi harîkariya her kesekî ku xwe li deriyê wî digirt û daxaza tiştekî ji wî dikir, navên bav û bavpîrê xwe her bilind û rûmetdar hêlan, nehêşt ku ewan hîç erzan û nizim bibin…

Robêrt pir caran bo peyrewên xwe digot:

"-Bawerî mirovan bilind dike…"